NAMAK VEKIRÎ

Rêz û silav ji hemî xwendevanên vê namê re …….!

Weke çawa gelên Kevin li gor zanîna wan bi stêrnasînê , her yekî an hinekan ji xwe re rojmêrek danîn wek , rojmêra rojê , heyvê , heyvûrojê û guhêrek .

Herweha gelên Mezopotamiya jî mîna Kasî , Somerî û Babiliyan jî hindiktirîn 2000sal B.Z rojmêr bi kar anîn .

Ji Medan vir ve Kurd jî rojmêrê bi kar tînin . Weke em dizanin rojmêr yan ji destpêka dîrokekê, yan jî , ji destpêka olekê destpêdike . Vêca gelê Kurd jî , ji xwe re du bûyerên dîrokî ji bo rojmêra xwe nîşan didin .

Dîroka yekemîn : Damezrandina serdariya Medan B.Z ,lê wek xuya dibe li ser yekîtiya Medan sê dîrokên cuda (653 , 649 , 700 B.Z) bi kar tên.

Dîroka duyemîn : Roxandina paytexta Imperetoriya Aşûriyan Nînewa ji aliya Medan ve 612 B .Z . Ji ber wê , îro ji bo rojmêra kurdî , du nêrînên sereke hene û li gor wan du nêrînan , du rojmêr jî bi kar tên .

Wek em dibînin ku , bikaranîna dîroka roxandina Nînewa , paytexta Aşûriyan bi destê Medan sala 612 b.z wek destpêk ji dîroka Kurd re , ji dîroka damezrandina serdariya Medan 649 , 653 , 700 b.z . rastir e , û bêtirîn cî digire .

Çimkî ji alîkî ve piraniya Kurdan , partî , rewşenbîr, nivîskar , rojname û kovar li bakur , rojava , başûr û rojhilat 612 B.Z bi kar tînin , û hindik ji Kurdan li başûr û rojhilat û bi taybetî Kurdên soran 700 B.Z bi kar tînin .

Ji aliyê din ve jî , dîrokzan li ser dîroka damezrandina serdariya Medan li hev nakin . Yanê weke li jor diyare , ew sê dîrokan bi kar tînin .

Li dawiyê banga me li hemî partî , komele û dezgehên sêvîl û fermî , rewşenbîr , dîrokzan , nivîskar …H.W.D , ku li banga me xwedî derkevin , lêkolînên pirjêder li ser vê mijarê çêkin û dest bi guftûgoyan di dermafê wê de bikin , ta ku , em çarakê ji vê cudekaranîna dîrokî re bibînin , û yek rojmêrê bi kar wînin .

Sipas ji guhdariya we re

2619K- 2008Z

Saziya fêrkirin û parastina zimanê Kurd li Sûriyê

S.F.P.Z.K.S